Îraq welatekî peçrîmekirî

Îsa Tahır

Parçekirin pêdiviye

Dibe aşkera be ku îraqa niho, wek pêkhateyekê cîwgrafî, yekeyek siruştî pêk nahîne, her weha ji aliyê etnî û ol û mezhebî ve, wek yekeyek wekhev û seqamgîr nahê naskirin. Bi kurtî Îraqa niho destkirdeyek kolonyaliye. Bê heza akinciyên wê, nemaze gelê kurd, hatiye pêkanîn û li ser hemû gelên Îraqê hatiye sepandin. Ev yeke jî piştî şerê yekê yê cîhanî bû.

Helbet bi dirêjiya wan salan, Îraqê aramiya siyasî, civakî û aborî nas nekire. Desthelatên hukim li Îraqê kirî, nekarîne, nasnameyek nîştmanî ji bo xelkê Îraqê durist bikin. Her dem hemû pêkhateyên Îraqê pitir hest bi nasnameyên xwe yên etnî û olî ji ya nîştmanî (heger hebe) kiriye. Ji ber ku ewan desthelatan her dem hewil dane cudayiyên ku Îraqê hene ji gel, netewe û ol mezheban bibihujînin û di yekeyek xapînok de kom bikin. Ewan hizir dikir ku yekbûn di nehêlana cudayiyan de ye, lê mêjûyê ev yeke şaş derxist û li şûna wê rastiyek din anî ziman ew jî ew e ku yekbûn di hundirê cudayiyan de derdikeve, demê biyav ji cudayiyan re hebe ku derbirînê ji hebûna xwe bikin. Bi kurtî Îraq pêkhateyek xuloleye, siste, dîwarê wê li ser berfê hatiye danan. Dewletên zilhêz, di demek mêjûyî de û ji bo berjewendiya xwe durist kiriye. Mêjûya Îraqê jî, eva tijî xwîn, ew rastiye aniye berhem ku pêkvejiyan di vî pêkhateyî de esteme. Piştî şerê azadiya Îraqê û nemana rijêma beis, delîvek mêjûyî ji bo gelên Îraqê peyda bû ku carek dî û li ser biniyatek mukum rêya pêkvejiyanê ji xwe re diyar bikin. Lê wesa diyare ku hêşta gelên Îraqê negihane wê astê şaristanî ku bizanibin çawa pêk ve bijîn, bê ku yek mafê yê dî bixwe. Her wesa gelek hêzên herêmî wesa dibînin ku îraqek dîmokirasî û fîderalî, ne di berjewenda wan de ye. Ji eva borî hemûyê û bi nerînek lojîkî, wesa diyare ku baştirîn çareserî ji bo derd

û êşên Îraqê ewe ku vegere ser siruştê xwe yê berê ku sê pêkhateyên sereke yên nelêk û nejêk pêk dihîne: Kurd û erebên sune û erebên şîeye.

Mêjû dupat dike ku hindî jêhate û nasnameya erebên sune û şîeye, nasname û jêhatek olî û mezhebî be pêkvejiyana wan esteme. Esteme kesek di dil û can, hizir û bîrên guropekî de, kesek pîroz be û bihayê wî nêzîkî bihayê pêxemberan be û heman kes di nêrîna guropê din de kesek pîs û lenetî be û bihayê wî nêzîk bihayê şeytanî be. Du kultur bi dirêjahiya mêjûyê hebûn û werar û nasnameya xwe ji berdewamiya hevdijiya hevdu wergirtibe, esteme ev du kulturên hevdij, bi hev re bijîn. Ev ji aliyê nakokiya mezhebî ve di navbera du pêkhateyên sereke de li Îraqê. Ji aliyê nakokiyên etnî ve, doxa wê ji doxa nakokiya olî hêşta kûrtir û mezintire. Wek diyar û eşkera, gelek netewe li Îraqê pêk dhînin, lê neteweyên sereke, kurd û erebin. Heger em li ser jêyatî bo nasnameyan rabiwestin, emê bibînin ku kurd heta astekî bilind nasnameya neteweyî hemûyan digehîne yek. Lê ereb wek pêkhateyekî neteweyî, mezhebî wek derzek xisitiye nasnameya wan ya neteweyî. Bi dîtina min, nasnameya neteweyî ya erebên sune ji ya erebên şîeye bi hêztire. Eve jî wa dike ku nakokî di navbera kurdan de hember erebên sune dijwartir be. Ereb ji aliyekî ve, xwe xwedan mêjûyek gelek zengîn dibînin, bi dirêjiya mêjûya Îraqê her dem

desthelat di destên wan de bûye. Core kesatiyek bo mirovê ereb çêbûye ku ew û desthelat yek watayê bibexşin, amadeyî nîne xwe dûrî desthelatê yan hevalekê li gel xwe bibîne. Gelê kurd jî xwe dibînin ku bi dirêjiya mêjûyê ji mafên xwe yên rewa hatiye bêbehrikirin. Êdî li ser xwe qebûl nake wekî caran bindest be û bê maf li ser axa xwe bijî. Hevdijiya van her du xwestekan, çi biyavê danustandinê nahêle û parçekirina Îraqê pitir beraqiltir dike.

Dê parçekirin wê çawa be?

Her kesê hizra parçekirina Îraqê dike, bêrawestan û bêdudilî, hizir dike ku îraq wê bibe sê parçe/dewlet: Kurdistan, Sunestan, Şiyestan. Her wek di kovareka leşkerî ya emirîkî de bi awayê nexşeyekê hatî. Helbet ev dîtine dîtinek lojîkiye, xwediyên vê dîtinê dibînin demê neseqamgîrî û nearamiya Îraqê ji egerê komkirina wan her sê pêkhateyane di yek dewlet de, helbet çareseriya wê jî dê bi parçekirina wê bo sê dewletan be, lê rûdanên mêjûyî, her dem bi lojîkê kar nake. Erê kesekê ji me hizir kiriye ku dibe parçekirin ne bi wî awayî be? Kî dibêje çi awayên parçekirinê ji bilî ya borî nînin? Eve jî me dikêşe pirsiyara here giring ew jî ew e: Parçekirin di berjewenda kê de ye?

Parçekirin û berjewendî

Hêza êkane ku bikare û şiyan hebe Îraqê parçe bike, Emerîkaye. Erê di vê demê niho de û bi van hevsengên siyasiyên heyîn, di berjewendiya Emerîka de ye Îraq bibe sê parçe? Parçekirina Îraqê bo sê parçeyan, bê derencam û dûvik nabe. Parçeya kurdî (Kurdistan) wê hesta serxwebûnê li dev kurdên parçeyên dî xurt bike û Tirkiya ku hevpeymanê nêzîk Emerîka û Suriya wê tûre bike. Parçeya erebên şîeye (Şiyestan) wê di bin kontrola Îranê ve be (wek niho ku siyasetmedarên şîe bi destê Tehranê livînê dikin) ango ev parçe wê bibe kûratiyek stratîjî bo Îranê, ev jî ne di berjewendiya Emerîka de ye û her weha dewletê erebên sune wê li dijî vî projeyî rabiwestin. Ango bi çi şêweyê heyî parçekirina Îraqê bo sê parçeyan ne di berjewendiya Emerîka de ye. Bi dîtina min, parçekirina Îraqê bo sê parçeyan, nemaze di vî seruberî û kawdanên dever tê re dibort, karek girane heger estem nebe. Yek sînaryo bo parçekirina Îraqê dimîne ew jî parçekirina wê bo du parçeyan: Deverek erebî ji bo erebên şîe û sune di çarçûveyê fîderaliyekê de û parçeyek kurdî, lê bi mercekî ku ev devera kurdî, Emerîka biparêze û bingehên xwe yên leşkerî lê dabine.